Lênûsk

Lorîn S. Dogan / Amed

Ji wexta ku li erebê suwar bûbû, tepîna dilê wê nesekinîbû. Tepîna ku bostbi bostwê berbi evîndarê wê ve dibir. Ew cara yekem bû ku demeke ewqas dirêj, ji wî dûr mabû. Du meh, du sedsal...! Heger xeyal nebûna, barê dûrbûnê nedihat ragirtin. Hevoka ku gelek caran wê ji xwe re dubare dikir ev bû. Di aramiya rêwîtiyê de, muzîka Vivaldi ku ji wolkmenê guhdar dikir, hestên wê zîztir kiribû. Selma, bi hestiyariyeke ku laş lê ditevizîne, maçekê dideyne ser kefa destê xwe. Dûre radihije lênûska xwe ya ku bûbû wargeha nameyên nexwendî! Di wan her du mehên ku ji wî dûr mabû, dema ku kela bêrîkirinê tevlî xwîna ...wê dibû, wê ev yek dikir. Maçek û nameyek

Bêrîkirinê laşê min bi ser hevdu de guvaşt. Ji tîbûna te haxte ez lêvên xwe bixwum... Niha ez bîranînên me yên ku her roj jiyan bi me şêrîntir dikirin, bi rêyan re parve dikim. Gund û bajarên ku di wan re diçim, bi bişirînên te diseyênim. Kêfa min ji rêyên ku min ber bi te ve tînin tê! Her ku rê li dû min dimînin, bêhna te ya li ber bêvila min dijwartir dibe.Axx... Bêhna te çiqas aramiyek bi giyanê min dixist. Çend car a ez di nav wê bêhnê de winda bûm û di hembêza te de bûm gulok. Çend car a çengên te yên bihêz, xwe li laşê min pêçan û birînên giyanên min aş kirin. Ji bo ku laşê min ji nav destên te neşemite, te çiqas min bi xwe ve dizeliqand evîndarê min! Wî wextî di hembêza te de, ez dibûm zarokeke ku ji şabûnê têr nedibû. Min di hembêza te de, zarokbûyina xwe ji nû ve jiya ...evîndarê min

Ax ew kolan... Ew kolanên ku heta lingên me dibûn heban em lê digeriyan. Kolanên ku di her gava wê de, me hêviyeke xwe lê dihişt... Kolanên ku bi têhna destê te bicoştir dixuyan... Wexta ku em li parqên wî bajarî digeriyan, çiqas kêfa me jî zarokên ku dile yistin re dihat. Wî wextî bi çavan, me çîrokeke nepen ji hevdu re digot. Û tenê bişirînek li ser lêvên me dima. Di wan demên ku li devê polê li benda te dimam, çiqas dem ji min re dirêj dihat! Te di polê de kêlî dijmartin, min li devê derî. Te çiqas gazin ji dersan dikir. Te digot, ev ders demên ku emê pevre derbas bikin, ji me didizin. Lê rojên ku di bin banekî de, em ê şevan bi hev re pîr bikin nêz e evîndarê min... Wê rojê ez li dayîka xwe mikur hatim û min jê re got, "Hezkiriyekî min heye." Tu nizane, bi eşkerekirina vî tiştî re laşê min çiqas lerizî. Tu nizane wê kêliyê çiqas ez soromoro bûm. Jixwe wexta diya min got, "Wê kengî were in te bixwazin?" zimanê min di devê min de pûç bû. Ez ne li bendî pirseke ".wiha bûm. Min ji nişka ve got, "Heta dibistan biqede

Ez zanim niha tu çiqas melûl bûye. Dema ku çend roja me hev nedidît, weke guleke ku bêav bimîne tu diçilmisî. Lê hindik ma evîndarê min, hindik ma ku ez bi evîna xwe te av .bidim

Selma weke ku zarokekê hembêz bike, lênûska nameyan di sînga xwe de didewisîne. Serê xwe dispêre paceya otobosê û dema ku wê lênûskê bide wî, xeyal dike. Dema ku wê du kaniyên evînê di nav hevdu de biherikin... Wexta ku ji paceya erebê çavên wê li tabeleya, "Riha 30 km" dikeve têhna laşê wê zêde tir dibe. Wolkmena ku ew pênc saet bûn jê muzîk guhdar dikir, dixe çentê xwe û ber biskên ber porê xwe ji nû ve rast dike. Ew ...pora ku gelek caran wî destên xwe li ser re biribûn û tayên wê jimartibûn

Ku erebe li otogarê bi cî dibe, pêşî ew çavên xwe li wî digerîne. Çavên wê, ji lêgerîna wî diwestin. Li devê erebê demekê di sekine. Tu pêjin jê naye. Dikeve şikê û axaftinên xwe yên dawî, bibîrtîne. Di telefonê de saeta ku wê suwar bibe, jê re got ibû. Lê çima nehatibû pêşiya wê? Pirsên hişê wê bêbersiv dimînin. Selma, bistûxwarî û qerem şikestî berê xwe

dide mal... Heta diçe mal bi rê de, hevokên wî yên di telefonan de, ji nû ve şîrove dike. Dengê wî di telefonê de piranî şikestî bû. Gelek caran hevokên wî nîvrê mabûn û gotibû, "Heta tu werî." Wî wextî wê ev yek dabû ber sedema dûrbûnê û tu pirsiyarî jê nekiribû. !Lê niha ev hevoka wî, xofekê dixe dilê wê

Wexta Selma dikeve hundir, xwe li bermalê gêr dike û tenê guhê xwe dide dengê telefona ku wê lê bixe... Birçîbûn û betilandina rê ne di bîra wê de ye. Bêdengiya hundir, rihê wê bi serhevdu ve dadiwerivîne... Hedana wê naye, bidudilî radihije ahîzeya telefonê. Dema ku dengê wî dike, bêhna wê fireh dibe. Selma wî ji hatina xwe agahdar dike. Evîndarê wê bi dengekî sar dibêje, "Heta saetekê ezê werim mala te." Gumanên di dilê Selma de zêdetir dibin. Lê dîsa jî ji bo ku baştir bixuye, kincên xwe diguherîne, porê xwe şe dike .û li bendî wî dimîne
Dengê zengilê derî pêtên dilê wê dîsa geş dike. Selma bi vekirina derî re, xwe davejê hembêza wî û bi maçên xwe dixwaze têhna xwe ya bêrîkirinê bişikîne. Lê Selma hîs dike ku laşekî ji evînê hatiye şûştin, di nav çengên wê de ye. Bi neçariyeke ku matmayîneke di hundirê xwe de dihewîne, çengên xwe li laşê wî sist dike. Derbasî hundir dibin û weke demên berê, li hemberî hev rûdinin. Lê her du jî, ne bi çavên berê li hev meyze dikin.
:Selma bi pirsên heyirî
?Çima tu nehatî pêşiya min? Li hemberî min, çima tu ewqas sar î-
.Weke kesekî kerr û lal gotin ji wî çênabe, tenê destên xwe di nav hevdu de difirkîne
Çima tu napeyivî? Di telefonan de hema te digot, "Heta tu werî!" Vaye ez hatim. Kerem-
?bike, tê çi bibêjî
:Evîndarê wê pêşî gotinan di devê xwe de dicû û dûre bi peyveke daqurtî
.Ez bidergistî bûme-
:Selma bihilçenîn dipirse
!?Te got çi-
.Gotin ji wî çenabe
.Min şaş fêm nekir ne wilo, te got ez bidergistî bûme-
.Serê wî di ber wî de û hîna bêdeng e
.Tu heneka dikî. Qene tu min bitirsîne tu wilo dibêjî-
.Na-
Çawana? Qeyem evîndarê bi heneka bûn û haya min ji vê yekenîn bû? Na... Ez qurbana-
.te me vê henekê dirêj neke, ez dikeribim
:Dengê wî zelaltir dibe
.Ez henekan nakim-
Bi gotina xwe re hungulîskekê ji nav xelîtka xwe derdixîne û dixe tiliya xwe. Weke ku

:barek ji ser mile wî rabûbe, bi bêhnfirehî dibêje
.Ez henekan nakim, ev meheke ez bidergistî bûme-
:Çavên Selma ku li hungulîskê aliqîne, fireh dibin. Hişê wê ji serê wê diçe û diqîre
...?Çawa tu bêbextiyeke wilo li min bikî?... Çawa-
:Tu gotin ji wî çênabe. Hêrs û dengê Selma zêdetir dibe
.Sedema vê bêbextiya te çi ye? Ev yeka ku te kiriye, tu exlaq û namûsa wê nîn e-
Wextaku peyvanamûsêjidevêSelmaderdikeve,ewjicihêxwedihilçeneûpêtênagir
:ji devê wî dihilpekin
Ya ku qala namûsê dike tu yî ne wilo?!... Ya ku salekê xwe di berê min de dirêj kir,-
...dersa namusê dide min. Xwedê zane bê beriya min te xwe di bin çend kesan de
Selmajipeyvênwîdihebite.Kesêkusalekêdihembêzaxwedelorandibûûbievînawî
sûndxwaribû,wêkêliyêdibewekelawirekî.Tenêdixwazejiberçavênwêwindabibe.
:Selma bi qîrîneke ku zingêniyê bi hundir dixe dibêje
...!Bicehime! Bênamûsekî wekî te, encax yeke weke xwe dîtibe-
:Beriya ku ji hundir derkeve, peyvên xwe yên dawî vedirîşe
Sixêfanjidergistiyaminreneke,tuneynukawênakî!Bûyedergistiyaminjîtenêjipaş-
...!dihêle. Lê tu... Ya ku salekê bêyî tu fermîbûneke, xwe ji pêş da min tu bûyî

Bigotinênwîyêndawîre,Selmadixwazekerrûlalbibe.Dilêwê,jiwîdixele.Jihêrsa
hetajêtê,derîlipaşwîbihicadidare.Şîrqîniyaderîdiçehemûmalênapartmanê.Selma
porêxwevediçirîne,lixwedixe.Dixwazelaşêxweyênkudestêwîliserreçûbû,bide
berkêra.Tutiştnikarewêbihedinenerêliberhêstirênwêyênkuliserhinarkênwê
bûbûnqemûşkbigire.Jigirî,bêhnlêdiçike.Dixwazeevînûjiyanêdibinlingênxwede
bieciqîne...Dixwazelaşêxwedibinlingênxwedebieciqîne...Çavênwêlilênûskaku
beriyaçendsaetan,jibokubidewîamadekiribûdikeve.Lênûskakudemênjiwîdûrbû,
ristênevînêlêdineqişand...Selma,bikerbûxezebekêradihijelênûskêûrûpelênwêdi
navdestênxwededikepiçikûparî.Têhnawênaşike...piçikênrûpelênnameyandinav
!diranê xwe de dicû û tiftike erdê